Dêûbavên/Weliyên ezîz

Em bi kêfxweşî we derbarê înîsiyatîfa nû ya Mohra Duzimanî ya Dewleta New Yorkê (NYSSB) li Herêma Navendî ya Dibistanan a Williamsville de agahdar dikin. Ev mohra dîplomeyê wan xwendekaran pesend dike ku heta qedandina lîseyê bi du yan zêdetir zimanan perwerde bûne û di asta bilind de bi ser ketine.

Armanca Mohra Duzimanî ya Dewleta New Yorkê ev e:

- peyitandina pirrengiyê di nav civakeke pirzimanî de;
- teşwîqkirina ji bo fêrbûna zimanan;
- ji bo kardaran nasandina mezûnên lîseyê yên xwedî şiyanên zimanî û pirzimanî;
- derbarê xwendekarên serî li zanîngehan didin de agahiyên zêdetir dide;
- xwendekaran ji bo şiyanên sedsala bîst û yekemîn amade dike; û
- li dibistanan naskirina nirxê zanîna zimanên biyanî û yê zikmakî.

Ji bo bidestxistina Mohra Duzimanî ya Dewleta New Yorkê, divê xwendekara/ê we hemû mercên pêwist yên ji bo mezûnbûna bi dîplomaya Regents bicî bîne û bi zimanê înglîzî û bi zimanekî din di asteke bilind de şiyana xwendin, nivîsandin **û** guhdarîkirinê hebe. Ev ziman dikare zimanekî li malê tê bikaranîn yan jî li dibistanê tê fêrkirin be. Xwendekarên ji bo Mohra Duzimanî ya NYSê hewlê didin, divê wekî ku di belgeyê de hatiye lîstekirin ji bo her zimanekî sê puanan bi dest bixin: "Bidestxistina Mohra Duzimanê ya Dewleta New Yorkê."

Hûn dikarin ji vê malperê derbarê NYSSBê de zêdetir agahiyan bistînin: http://www.nysed.gov/bilingual-ed/schools/new-york-state-seal-biliteracy-nyssb

Ev imtiyaz di dawiya her saleke xwendinê de bo mezûnan tê dayîn. Heke hûn bixwazin zaroka/ê we ji bo sala xwendinê ya 2024-2025an ji bo bidestxistina Mohra Duzimanî ya NYSê hewlê bide, tika ye ji girêdanka xwarê li kirîtêrên WCSDê ji bo bidestxistina NYSSBê binêrin û heta 21ê mijdara 2024an, roja pêncşemê forma di lînka xwarê de dagirin.

Kirîtêrên WCSDê ji bo bidestxistina NYSSBê

Serlêdana Xwendekarab | 2024-2025 Mohra Duzimanî ya Dewleta New Yorkê

Li gel silavan,

Williamsville East High School	Williamsville North High School	Williamsville South High School
Lorena Wagar lwagar@williamsvillek12.org	Kaherine Rautenstrauch krautenstrauch@williamsvillek12.org	Lori Chilcott lchilcott@williamsvillek12.org